Ji anatomiya jinekê

Gulizar

(Dersa yekemîn)

1- Bi tîpekê dûrî janê ye

2- Zimanê wê qedexe ye ji dilê wê re
Pira di nava dil û zimanê wê de şikestî ye

3- Her qermîçokek rûyê wê xwediyê çîrokeke dilşewat e

4- Her tim du dilop hêsir dibin şirîkên kenên wê

5- Cênîkên wê nobedaran xwedî dikin, ji bo kontrola çavên wê

6- Tim bi stûxwariya diya heft qîzan dijî

7- Ji bo girêbidin zimanê porê wê, dolbendekê avêtine serê wê

8- Ji kerba dilê xwe yê parçebûyî re bi ta û derziyê re bûye heval,
kêlan diavêje navbera xeyal û jiyanê

9- Gava dizewice evîna xwe dike kûzekî û dihere ber derê mala zavê
Tevlî wê evîna qaçax ya di dil de nikare têkeve hundur
Ji ber ku çavên wê bar nabe ji kesê re jî nahêle
Li erdê dixe, parçe dike û gav diavêje dojeheke nû.

10- Meşa wê bi usûl kena wê bi tore ye

11- Li ber destaran li rastiya jiyana xwe hay dibe
Xeyalên xwe jî tê de hûr hûrî dike

12- Gava her serê sibê tenûrê dadide, ji bo li jiyanê bimîne, daxwazên xwe dike ardû û zikê zarokên xwe têr dike.

13- Jiyan ji destên wê yên qemer diherike, lê mêr jê re dibe hewî.
Hewî devê felekê girê dide û wê li ber çavên jiyanê reş dike.